Ahenga Roja rojnamevaniya kurdî Li gundê Elî Bedranê

Di bîranîna 109 saliya roja rojnamevaniya kurdî, li gundê ELÎ BEDRANÊgundê ŞAHA REMO de, partiya me partiya YEKÎTÎ YA DÎMOQRAT A KURD LI SÛRYÊ (YEKÎTÎ) festivalek li darxist, gelek rewşenbîr, helbestvan, nivîskar, hunermend , rojnamevan û jimarek ji kesayetiyên Ereb û Asûrî vexwestîbûn vê fistîvalê.

Koma MÎDYA û bi beşdariya koma RONAHÎ ya ALIYAN, koma DÊRIKÊ, TIRBESPIYÊ, MÎTAN, HELEBÇE, RONAHÎ. Destpêkê pîpinokek bê deng û lebat li ser canê pakrewanên kurd û kurdistanê rawestiyan, dûre sirûda EY REQÎB, gelek stiran, şano û dîlan ji cemawer re pêşkêş kirin, di nav re gotina kovarên kurdî , birûska weşana NEWROZ hate û gotinek ji aliyê helbestvan KONÊ REŞ ve hate xwendin, gotina Ragihandina Şamê jî ji bal mamoste ZUHÊR ELBOŞ ve hate xwendin. Nûnerê WEŞANA NEWROZê ev hevpeyvîn bi hin ji mêvanên fistîvalê re kirin:

-MIHEMED QASIM (Ibnilcezîre):

Rojnama kurdî gelekî li paş e, siyasetê cihê rojnamê girtiye, rojname pêşnakeve ku xizmeta gelê xwe neke, tê xwestin avakirina rojnamek çerxvan û destgehî, ji partiyan tê xwestin ku destê xwe ji ser rojnamevaniyê hilînin û kesê rojnamenas divê tê de bi xebitin

BERZO (nivîskar) : Rojname gelekî li paş e ji aliyê cûreyî ve kovar in hene derdikevin wek NEWROZ, HEVIND, PIRS çerxane ne. Lê hine din hene, gerek navê rojnamê li wan nebê, wek nimûne GELAWÊJ, ji ber ku demek dirêj di navbera jimarekê û ya din de heye, ji vê jî nivîskar ji wan bazdidin. Rola nivîskaran gelek heye; ji ber ew çavê gelê xwe ne, kesên serbixwe nikarin bi tena xwe derxin, bêyî partiyan nayê derxistin, astengên rojnamê bi rewşa kurdî û mafê rewşenbîran ve girêdayî ne.

-EMER RESÛL(rewşenbîr): Rojnamevanî karekî gelek pîroz e, rola wê gelekî di pêşveçûna miletan de heye, ta em rojnamek durust û girêdayî bi doza gelê xwe ve peyda bikin, rojnamek azad giringe, astenga sereke ew e peydakirina xwendevanekî kurd e, ya din belavbûna tevgera kurdî ye.

- Dr.SERBEST NEBÎ: Gerek em weşana pirobagandeyî û pirsgirêka rojnamê ji hev derînin, rojname ferehtir û giştyantir e ji belavokên aydiyolocî û probagandeyî xwedî dûrbûnek arîşenî, ez nabînim ku dîroka rojnama kurdî dest pê dike bi derketina kovara KURDISTAN ya di sala 1898z derketî, rojnama kurdî û çi rojnamek heyî ,yek ji mercên wê, hebûna civakek şarewerî serbixwe ye,

→